FIRAT CEWERÎ



# DÊ ŞÊRÎN E

Institut kurde de Paris

UPPSALA 1983

Institut kurde de Paris

922 CEW DES

K.C. 922.(3)
(+1 R.)

FIRAT CEWERÎ

Wẽne: MEYRO ZÎLAN

Institut kurde de Paris

# DÊ ŞÊRÎN E

UPPSALA 1983

Institut kurde de Paris

Copyright: FIRAT CEWERÎ
Illustrationer: MEYRO ZÎLAN

AOffset, Uppsala 1983

# NAVEROK

Zarokno,hevalên hêje û delal . . . 5
Ya herî baş xwendin e. . . . . . . . . . 7
Ala min . . . . . . . . . . . . . . . . . . 10
Pêşmergê piçûk . . . . . . . . . . . . . 12
Vegere bavo . . . . . . . . . . . . . . . 14
Dev navêje pîrka xwe . . . . . . . . 16
Ez im zanê dibistan . . . . . . . . . 18
Wer em herin dibistanê. . . . . . . . 20
Min ev şîret girt ji giran . . . . . . 22
Ap û birazî. . . . . . . . . . . . . . . . 24
Berxikê mamostê xwe me . . . . 26
Dê şêrîn e . . . . . . . . . . . . . . . . 28
Kalo Dîban . . . . . . . . . . . . . . . 36
Hewşa dibistana me. . . . . . . . . . 37
Tu şêrîn e dayê . . . . . . . . . . . . 40
Name ji diya min re . . . . . . . . . 42
Pîra Eyşê û gavan . . . . . . . . . . 48
Rovî û qeraş . . . . . . . . . . . . . . 51

Institut kurde de Paris

# ALFABA KURDÎ

| Bi tîpên gir | Bi tîpên hûr |
| --- | --- |
| A | a |
| B | b |
| C | c |
| Ç | ç |
| D | d |
| E | e |
| Ê | ê |
| F | f |
| G | g |
| H | h |
| I | i |
| Î | î |
| J | j |
| K | k |
| L | l |
| M | m |
| N | n |
| O | o |
| P | p |
| Q | q |
| R | r |
| S | s |
| Ş | ş |
| T | t |
| U | u |
| Û | û |
| V | v |
| W | w |
| X | x |
| Y | y |
| Z | z |

Institut kurde de Paris

# ZAROKNO, HEVALÊN HÊJA Û DELAL!

Min ev pirtûk ji bo we nivîsand, ji bo we zarokan. Gelo hun ji navê wê hez dikin? "Dê şêrîn e" Ma ne rast e, qey dê ne şerîn e, zarokno? Ma ne diya me ye, ku serê me dişo? Ma ne diya me ye, ku li dû me digirî? Ma ne diya me ye, ku em anîne dine?

Lê wê ji bo çi dê ne şerîn be? Dê şerîn e, zarokno!

Gelo hun wekî din bi çi dilebikin û ji çi hez dikin? Gava ku ez weke we zarok bûm min ji xwendinê, ji kar û ji hevalên xwe hez dikir. Lê rojekê min û hevalekî xwe li hev xist. Min û wi hevalî pir ji hev hez dikir. Gava ku me bi hev re lîst wî fen kir, ku min dî wî fen kir, min xwe lê rakşand û kevirek avête jê de. Kevirê min çû û li serê wi ket. Gava ku min dî xwîn ji serî hat, ez pir poşman bûm û min ji tirsan bazda malê. Piştî wê bavên pê hesiyan û li hev rabûn. Wan hevdu ji me bêtir êşandin û heftekê bi hev re nepeyivîn. Lê ê me, em piştî wê bi saetekê li hev hatin û me dîsan weke berê bi hev re lîst. Gava ku bavên me bihîst ku em weke berê bi hev re dipeyivin û dileyizin û ew ji hev xeyidî ne û bi hev re napeyivin, hingî li ber xwe ketin û ji xwe şerm kirin.

Rojekê em bi malî çûn mala hevalê min, ji bo ku bavên me li hev bên û bi hev re bipeyivin. Hingî bavê min ev gotinên han ji bavê hevalê min re got:

–Cîran, bi sere bavê te ne rast e, ku em ji bo zarokan li hev dixin û xwe ji hev dixeyidînin. Zarok saf in. Tiştekî nebaş û xerab di dilê zarokan de tune. Lê ji me mezinan re şerme, ku em zarokan hînî nebaşiyê û şer dikin. Ha îro li hev xistin dê sibe li hev bên. Yê me em ne wa ne, ku em

Institut Kurde de Paris

derbekê li hev xin an dilê hev bihêlin, êdî em dibin dijminên hevdu û mala hevdu wêran dikin.

Di wê navberê de bavê hevalê min cigare îkramî bavê min kir. Piştî ku bavê min cigara xwe vêxist, dîsan peyıvi:

-Dibên, du cîran hebûn. Herdu cîranan pir ji hev hez dikirin. Lê rojekê zariwên herdu cîranan li hev xistin, piştî li hevxistina zarokan, herdu cîran li hev radibin û hevdu rezîl û kepaze dikin. Dikin nakin naxin serê hev. Dawi dawi, her yek lawê xwe li kolana xwe dike û berî didin mala şêx ji bo gilî. Gava herdu bav bi rê de diçin, zariwê wan li ser kolanên wan, lingên xwe li kêlekê wan dixin(weke ku mirov lingên xwe li bin zikên hespan xe) û ji hev re dibêjin.

-wer em hespên xwe bibezînin, bê hespên me kê beza ye.

Hingî herdu bav ji kirinên xwe şerm dikin û paş de vedigerin.

Piştî ku bavê hevalê min axînek kişand got:

-Welleh rast e, cîran! Şerm e ji me mezinan re, ku em zarokan hînî xerabî û nebaşiyê dikin.

Lê, zarokno! Divê ku em wisan mezinan şermkar derxînin. Ji bo vê jî divê, ku em ji hev hez bikin, bi hev re bileyizin, bi hev re bixwînin û bi hev re kar bikin.

Ez hêvîdar im, ku dê ev pirtûka di destên we de hin tiştan hînî we bike û bala we bikşîne ser zimanê dayika we.

Nemaze bi wêneyên xuşka me MEYRO ZÎLAN pirtûk hîn xweştir û bi giyantir dibe. Bi qasî helbestan dê kêfa we ji wênan re jî bê.

FIRAT CEWERÎ

Institut kurde de Paris

# YA HERÎ BAŞ XWENDİN E

Gava ku me mal bar kir
ji gund  em çûne bajêr
Diya min got: Kurê min
Bixwîne, bibe wek şêr

Hingî bavo qeherì
Çav serî de bûn tas
Got: Tu kes bi xwendinê
Nebûne xurt û mêrxas

Diya min ser de rabû
Got:Li lêwik wa neke
Xwendin e ya herî baş
Wek xwe nezan raneke

Bavê min êdî bû ar
Êrişî diya min kir
Bi lêxistin û xeber
Got:Tu me neke kafir

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Diya min dîs ber xwe da
Sûnd xwar bi serê Xanî
Got:Heta ku ez sax bim
Kurê min dê bixwînî

Bavê min hema rabû
Xwe avêt guliyên wê
Lêxist, jê re xeber da
Got:Qahpika kerxanê

Hingî min kire qîrîn
Ji kerban min xwe negirt
Min dehfek da bavê xwe
Û peyvên diya xwe girt

Ji wê rojê û vir de
Min xwend û bû me mezin
Niha bi kêf em dijîn
Digel dê û bavê min

Institut kurde de Paris

# ALA MIN

Ala min, a kesk û sor,
Hilkişe asmanê jor!
Tu xwe veke ala min
Hemêz bike hawîdor.

Ew rengê te yê spî
Wek kevoka aşitî
Tu bifire ala min
Hemêz bike yên kuştî

Bi rengê xwe yê zerîn
Derd û kulan birevîn
Jînê xweşke ala min
Wek roja asmanê şîn.

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

# PÊŞMERGÊ PİÇUK

Ez peşmergê piçûk im
Binêr, min heye tufeng
Piçûk im, lê wek hût im
Va ez dikim herim ceng

Ez ê jî wek bavê xwe
Şer bikim  ta mirinê
Bo em bibin serbixwe
Li ser kujê vê dinê

Dayê, megrî li dû min
Ji bo min nexwe xeman
Ez ê jî wek bavê xwe
Şer bikim bo niştiman

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

# VEGERE, BAVO!

Bavo, bes e, vegere!
Ma ev bûn çend salên te
Çi dibe bavo, were
Mezin bû ye lawê te.

Diya min, min re dibe:
-sêwiyê pîs, ê heram
Ger ku bavê te baş ba
Tu nediket ber piyan.

Bavo, qey tu ne baş e?
Tu çû û hew vegerî
Vê hêsîra diya min
Ji bo te tim digirî.

Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris

# DEV NAVÊJE PÎRKA XWE

-Bavo, çima pîrka min
Ew wilo bi ecêb e?
Wê rojê wer hejiya
Min got, dê serî jê be

-Kurê min, ew pîr bû ye
Ew ê jixwe biheje.
Gava mirov pîr dibe
Mirov bi dar dimeşe

-Ji bo çi ez ne wa me?
Binêr! Va bê dar diçim.
Serê min jî naheje
Gava ku dilebitim

-Wa nebêje, lawê min!
Dev navêje pîrka xwe
Dapîra te pîr bû ye
Nikar bê ser hişê xwe

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris


## EZ İM ZANÊ DIBISTAN

Ez û Rêzan û Mizgîn
Di çinkê de dixwînin
Mamoste çi dibêje
Em zû dinivisînin

Dù re ew pirsan dike
Ji min, Rêzan û Mizgîn
Dibêje:Bersiv bidin
Ka bê hun çi elimîn

Ez zùka bersiv didim
Berî Rêzan û Mizgîn
Hè hê hê, ez im zana
Bi xwendin ù nivîsîn

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

# WER EM HERIN DIBISTANÊ

Gava diçim dibistan
Ez pirî kêfxweş dibim
Ez guh didim mamostan
Bi peyvên wan geş dibim

Va ez diçim dibistan
Hînî xwendinê dibim
Ji bo nemînim nezan
Divê ez pir bixwînim

Werin gelî hevalan
Wer em herin dibistan
Bixwînin, binivîsin
Bo em nemînin nezan.

Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

# MİN EV ŞÎRET GIRT JI GIRAN

Ez piçûk im, çûkê biran
Qet nizanim bikim viran
Min ev şîret girt ji giran
Ez rastgo me, nakim viran
Ez rastgo me, nakim viran

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

## AP Û BIRAZÎ

-Apo, ez ê bixwînim
Ta dibistanên bilind
Da rastiyê bibînim
Têbigihêm baş û rind

Apo, tu car bê xwendin
Tu mirov naçine pêş
Divê ku em bixwînin
Da derkevin serê kêş

-Bijî biji, birazî!
Çi gotinên te yên xweş
Ger ku tu vê bixwazî
Ruyê me namîne reş

-Ez tim vêna dixwazim
Lo apo, ez bi qurban!
Min qet navê ku razim
Va diteqim wek volqan

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

# BERXIKÊ MAMOSTÊ XWE ME

Ez wek Kotan ne xereb im
Porê kesî nakşînim
Ez guh didim mamostan
Û derza xwe dixwînim

Yê li nik min, Mistiko
Tim dehfan dide Kotan
Kotan jî li wî dixe
Ew guh nadin mamostan

Lê ê min ez bi aqil im
Ez li Kesî naxînim
Gava hin li hev dixin
Wan ji hev diqetînim

Ji ber vê ye, mamoste
Min re dibê: Berxiko,
Tu ye ê baş û zane
Ne kotan û Mistiko.

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

# DÊ ŞERÎN E

Rokê min got: Nayêm malê
Ji wê pîra diya xwe re.
Got:Kurê min de ka bêje
Tê li ber deriyan qey bigere?
Min dehfek  da yê
Kete xwarê
Giriya û hêsrên wê hatin xwarê
Pir tê neçû
Disan rabû
Xwe avêt min li malê
Ez maç kirim
Çûm destên wê
E'ji giriyam
Û ji kerban ketim tayê
Wê nuhurand, kelemek got
Li ser jinê
Ser mirovan

Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris

Dîsan giriyam
Min xwe negirt
Ji kerban reviyam ji derv
Çûme sûkê
Nav hevalan
Li wir devê min  ket hev
Di nav wan de
Nişka ve ketim
Kom bûn heval
Dost li ser min hatin hev
Bi hêl rabûm
Û min baz da
Min berê xwe da malê
Min li derî da
Ketim hundir
Min dî tune pîra dê
Dîsan giriyam
Min kir qîrîn
Min got: Dayê, min bibîn

Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris

Deng ji axur hat
Dengê pîra diya min
Got:Kurê min
Bi bazdan wer
Dûpişk dike min vede

Min li ber dupişk veq veda
Min nehişt derbas bibe
Têkeve xanyê malê
Min rahişt dêr
Bi gir çûmê
Min nehişt ku tev bilive
Min li serî da
Terî kil bû
Ku hebkî ma
Ruh jê çû

Institut Kurde de Paris



Institut kurde de Paris

... KURDE de PARIS
- Secteur Animation -

Min û diya xwe
xwe li hev pêça
Di nav me de nema tu hîm
Ez keniyam
Ew jî keniya
Me herduwan
Ji hev re got
Me got:Bimre mar û dupişk
Û Fesadê Melkemot

Institut kurde de Paris



# KALO DÎBAN

Ez çûm mala Kalo Dîban
Wî ji min re çîrok got
Li ser jînê, ser mirovan
Dil û ceger li min sot

Kalo Dîban bi emir e
Belkî zêdeyî heyştê
Di dest wi de timî gopal
Piştek spî li piştê

Ez tim diçim cem mala wan
Li min şîretan dike
Pirî baş e Kalo Dîban
Ew ji min pir hez dike.

Institut kurde de Paris

## HEWŞA DIBISTANA ME

Hewşa dibistana me
Herçar alî lêkirî
Hundir hewşê de bexçe
Jêrî wê rezê tirî

Her sibe ku ez diçim
Berî tèkevim dersê
Ez zû bexçe av didim
Bi satil û tenekê

Ez ber leman çêdikim
Bi tevrî û bi bèrê
Pelên ku hişk jê dikim
Ji bonî gul pê ve bê

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Bexçê dibistana me
Pir hêşin e wek kevzê
Gava ku mirov diçê
Bêhna buhiştê jê tê

Hewşa dibistana me
Herçar alî lêkirî
Hundir hewşê de bexçe
Jêrî wê rezê tirî

Institut Kurde de Paris

## TU ŞÊRÎN E,DAYÊ!

Dayê,te ez neh mehan
Di zik de xwedî kirim
Bi jarî,bi hêsîrî
Va te ez mezin kirim

Gava ku min digot:Ax!
Ez nexweşim,lê dayê!
Tu bêî giyan dima
Ji bo min diket tayê

Lê îro va mezin im
Bi hiş û xwenda û geş
Zanim ku tu şêrîn e
Tu ye ya ku herî xweş

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

## NAME JI DIYA MIN RE

Diya min a kevnejin
Gazina meke ji min

Ez pir dûr im,birîn kûr
Serî,pişt û ling û hûr

Tim ji bo we dinalim
Ser peyva bavê kal im

Pir tehb û pir hêsîrî
Ez baş zanim ku we dî

ji bo vê yekê e'jî
Dihizirim bi mejî

Pir pîlanan datînim
Da ku ez bi cî bînim

Bi mêjî û bi aqil
Dihizirim tim ji dil

Carna xewnan dibînim
Leşker min ditirsînin

Institut kurde de Paris




Institut Kurde de Paris

Lê di xewnê de carna
Wek henekên wan salna

Ku me şev derbas dikir
Ji ken dibûm wek agir

Ji nav xewnên min bêtir
Ew rojên bi kêf ji dil

Ku em tev le eywanê
Te digot:Lê cîranê!

Ji bo min te nan dixwast
Da bixum tirşik û mast

Welhasilî ew xewnin
Lê wek rast e li cem min

Yadê,pir diponijim
Carna xew de dibizim

Ez li vî kujê cîhan
Her ji bo pariyek nan

Institut kurde de Paris

Tim li we difikirim
Weke li ser agirim

Dîs dibêjim,lê dayê!
Bê we sebra min nayê

Aha!..tu li vê şansê
Şeytan dibê:De razê

Dibawişkim li ser hev
Devê min nakeve tev

Hîn pir hebû ku bêjim
Va pênûse davêjim

Hubir nema çi bikim
Ez zanim ev hindikin

Ji can û dil ez selam
Li te dikim ez xulam

Têm destên te bi kêfxweş
Bi dilkî paqij û geş

Institut kurde de Paris



Ferê te re bavê min
Pir heye silavên min

Tê me herdu destên wî
Dipirsim li halê wî

Êdî hew karim bêjim
Ji bê xewî ez gêj im

Dîsan silavan dikim
Sala we pîroz dikim

Biminin di xweşyê de
Hun di heştê yekê de

Institut kurde de Paris

# PÎRA EYŞÊ Û GAVAN

Çêleka pîra Eyşê
Îro nehati bû mal
Pîra Eyşê ji ber wê
Digirya,dikir hewar

Lê paşê pîra Eyşê
Rahişte gopalê xwe
Zûka derket ji hewşê
Çû mala gavanê xwe

Gavan ser şîvê de bû
Pîra Eyşê ket hundir
Çavêng gavên beloq bû
Gava pîrê pirs jê kir

Pîrê gopal hilda jor
Ser gavên de qîriya
Bo çêleka xwe ya sor
Hîna jî digiriya

Institut Kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Gavên bi herdu destan
Xwe ji pîre zû parast
Ew di cî de rawestand
Jê re got gotina rast

Gavên got:Pîra Eyşê
Çêleka te hate gund
Ka her binêr li hewşê
Tu binêre baş û rind

Zû derket pîra Eyşê
Wê berê xwe da malê
Dît ku çêlek li hewşê
Mexel e li ber darê

Institut Kurde de Paris

# ROVÎ Û QERAŞ

Dibên rojekê
Rovî û qeraş
Dibin destbirak
Hevalin pir baş
Rovî dipirse,
Qeraşê delal
Qey nazewicî
Nabî xwedî mal?

Qeraş dibêje:
- Tu kes min nakin
Ber ku ne çeleng
Xweşik û çak im

Rovî dibê:Tu
Bi ya min nakî
Te bi zava kim
Weke hevalkî

Institut Kurde de Paris



Institut Kurde de Paris

Yê Qeraş dibê:
- Roviyê delal
Bin qenciya te
Çawa bê me xwar

Rovî dibêje:
- Hevalê aşvan
Em bo te bînin
Keçika Sultan
Ez pir bi hêz im
Min heye xwedî
Temamê guran
Û teyr û rovî

Qeraş ji wîna
Hingî bawer kir
Got:Lê em çawa
Keçê bînin vir ?

Rovî got: Wêna
Tu bispêre min
Ez keça Sultan
Te re dikim jin

Institut kurde de Paris

Rovî ji nik wî
Da rê liviya
Ji deştê derket
Berî da çiya

Wî cara yekem
Ban roviyan kir
Giş vehewandin
Li nik xwe kom kir
Paşê bi qêrin
Bi dengekî gur
Got:Gelî teyran
Û hevalên gur
Birevin,werin
Me heye civîn
Keça Sultankî
Em ê birevîn

Teyr û gur bazdan
Hatin nik rovî
Gon: Ev giran e
Seydayê kovî

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Rovî got:Na xêr
Karên wa sivik
Hê we nedîne
Tu caran bê şik

Gur got: De ka bêj
Em çito bikin ?
Keçê bixwazin
An ji wir rakin ?

Rovî got: Binêr
Hun guh bidin min
Pêwîst e ku em
Hin fenan bikin
Em ê zû rabin
Ji vir bidin rê
Bi kêfek mezin
Herin ba qesrê
Em heçên rovî
Em ê dêlên xwe
Bizîzikînin
Bavên piştên xwe

Institut kurde de Paris

Lê heçên ku gur
Bila bizûrin
Eyn weke çele
Bilind biqûrin
- Hê hevalên teyr
Yên hêja û baz!
Hun jî bifirin
Dor qesrê perwaz
Hingî hemûçik
Dê derkevin der

tev keça Sultan
Ya wek zêrê zer
Em ê reqisin
Teyrê pir mezin
Bila rahêj wê
Û em ê bazdin

Gişan gon: Baş e,
De em bilezin
Herin ber qesrê
Xweş bireqisin


Institut kurde de Paris


Giş rabûn meşîn
Bi lezek pir xurt
Çûne ba qesrê
Dora wê dagirt
Rovî reqisîn
Guran kir zûrîn
Teyrên baş û baz
Xweş bilind firîn
Pir neçû keçê
Serê xwe derxist
Lê wî teyrê baz
Xwe li çavan xist

Rovî got: Bazdin
Em zû birevin
Berî ku malî
Bi me bihesin

Welhasil bazdan
Ji wir reviyan
Ew keçik anîn
Mehr kir li Aşvan

Institut kurde de Paris





Institut kurde de Paris

Piştî mehekê
Rovî got: Hela
Ez bihêçînim
Vî Qeraşê ha

Rokê sibê zû
Li ber devê êş
Bi qestî civand
Li wê derê mêş

Û xwe dirêj kir
Mîna ku mirî
Got: Hela bê ev
Heval çawan î

Qeraş ku derket
Ew çi dibîne
Ku li ser Rovî
Mêşan guvîn e

Hema Qerêş zû
Rahişt lingên wî
Ew avêt nav çem
Got: Pîse rovî



Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Piştî vegerî
Meşî ber bi aş
Rovî ban wî kir
Got: Hey lo Qeraş
Min tu kir zava
Zavê Sultanan
Tu bi min bigrî
Bavê nav çeman

Gava ku Rovî
Ev peyvên han got
Dil û cegerê
Jina Qerêş sot

Jinik giriya
Bi dengekî zîz
Got: Ez nabim jin
Bo Qeraşkî pîs
Got: Çawan dibe
Keça Sultankî
Bibe bermalî
Bo Aşvanekî



Institut Kurde de Paris


Institut kurde de Paris

Rahişt buxça xwe
Ji derî derket
Got: Bi soz û ahd
Venagerim qet

Gava Qereş dît
Ku jina wî çû
Ew rabû ser xwe
Çû cem Rovî zû
Dest bi lavan kir
Û bi bergerîn
Got:Ca çi dibe
Jinê vegerîn
Rovî got: Na xêr
Vê bi te nakim
Bo yên wekî te
Qenciyê naki

Dîsan Qeraşî
Bi stûxwarî
Got: Ca çi dibe
Bike vî karî

Institut kurde de Paris

Tu bawer bike
Ger ku jinik nê
Ez bê wê najîm
Tu car li dinê

Piştî van peyvên
Qeraşê bi ard
Seydayê kovî
Dîs serî hejand

Îcarê Qeraş
Çû dest û lingan
Got: Tu ji bonî
Xatirê Yezdan
Bi dû wê ke ve
Her wê vegerîn
Berî ku li min
Biherime jîn

Rovî xwe piçkî
Vir wê de leqand
Ji Qeraşî re
Dîs serî hejand

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Qerêş dilê xwe
Bi xwe şewitand
Got: Ez ji te re
Bibim bi qurban
Tu rab xwe kar ke
Û bide dû wê
Dibe ku jinik
Dîsan paş de bê

Rovî ponijî
Li Qerêş nêrî
Got: Tu jinê re
Bibe bi gorî
Va ez ê dîsan
Her te re bînim
Lê tu zanibe
Ne gêj û dînim

Derket û bazda
Da dû jinikê
Pêşbirrîn lê kir
Got: Bisekin lê!..

Institut kurde de Paris

Jinik sekinî
Bersiv da Rovî
Got: Ber bi min nê
Paş de vegerî

Rovî got: Xatûn
Hela raweste
Min du peyv hene
Ku bêjim bo te

Xatûn rawesta
Rovî gihaşt cem
Got: Min fêhm nekir
Qey tu bû dilteng ?

Xatûn bersiv da
Got: Veger Rovî!
Bo Qeraş nabim
Seydayê kovî !

Rovî xwe şaş kir
Got: Te gote çi ?
Kê gote Qeraş
Zûka bêje hi...

Institut Kurde de Paris


Institut kurde de Paris

Xatûnê got: Lê
Ma te gote çi ?
Ka tu zû bêje
Wê ji bo na mi

Rovî keniya
Got: Xuşka Xatûn
Min negot Qeraş
Bi şerefa bûm

Dîsan Xatûnê
Ji Rovî pirsî
Got: Lê te got çi
Ka zûka bejî

Roviyê min û te
Terya xwe kil kir
Xatûne re got
- Ka tu were vir
Got,min ji wî re
Negote Qeraş
Min jê re got ku
Xwedyê milk û aş

Institut Kurde de Paris

Hingî Xatûnê
Nerm bû wek hevîr
Got,bibuhire
Mîrê baş û jîr

Û da dû Rovî
Meşîn ber bi aş
Qerêş Rovî re
Got: Biji şabaş

Piştî çendakî
Çend roj û çend meh
Rovî zeyif bû
Wek simbilê ceh
Rokê ji rojan
Qeraş çû seydê
Gava vegerî
Jinikê gotê:
- Ma ne mêrê min
Rovîkê me mir
Rahêj ter_ya wî
Bavêj ser zibil

Institut kurde de Paris


Institut Kurde de Paris

Hingî Qeraşî
Dest bi girî kir
Got: Çawa dibe
Çito Rovî mir ?

Jinê got: Nizam
Gava ez rabûm
Min dî ku Rovî
Bû ye rengê bûm
Ew dirêj bû ye
Li ber devê êş
Li ser kom bû ne
Hin kelmêş û mêş
Qeraşî dîsan
Sê keser veda
Jinikê re got:
- Em çi kin vêca ?

Jinê got: Rahêj
Bavêj ser sergo
Berî ku bidê
Heyv û tav û ro

Institut kurde de Paris

Yan na ji bêhna
Em nika bijîn
Berî pîs bibe
Ev xaka şîrîn

Qeraş poniji
Sê ro,sê şevan
Navêt devê xwe
Ne nan û ne dan
Lê gava ku dît
Bêhn kete dorê
Rahişte Rovî
Avête jorê

Serê we sax be
Roviyê me mir
Lê ew nebû hîm
Bo kesên dilkul
Ev çîroka me
Li vir qediya
Wextê we xweş be
Roj bide çiya.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
ENTRÉE N° 1389

89
CEW

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

K.I